



LANDKREIS LÜNEBURG
DER LANDRAT

Landkreis Lüneburg · Postfach 20 80 · 21310 Lüneburg

Korona-Xeta tîlefonê hemwelatiyan
Navçeya Lüneburg
Auf dem Michaeliskloster 4
21335 Lüneburg

Têlêfon 04131 26-1000
impfzentrum@landkreis-lueneburg.de
Demjimêrên Duşem - Înê li demjimêr 8ê
nivîsgehê danê sibê - 4ê danê êvarê
Şemî - Yekşem li demjimêr
10ê danê sibê - 1ê danê
nîvroj

Lüneburg, 25ê Çileyaya 2021

**Vaksîna-Koronayê jibo kesên 80 salî û bêtir:
Rendevû li Navenda Vaksîna-Koronayê ya li Lüneburg**

Hemwelatiyê hêja,

pandemiya koronayê nêzîkê salek e ku jiyana me ya rojane diyar dike. Me tîkiliyên xwe kêmkirin, em rûdank li xwe dikin û divê em pir li hevûdu hişyar bin. Vaksîna-Koronayê hêvî ligel xwe tîne: Heke gelek kes vaksîn lêxên, em dikarin vîrûsê rawestînin. Ev hevdiştinan ku em pir bêriya wan dikin, dîsa gengaz dike.

Hûn 80 an pîrtir in an jî di demê nêzîkê de cejna 80 salî ya xwe pîroz dikin. Ji ber vê yekê hûn ji koma yekem a mirovên ku dikarin li Almanyaya vaksîn lêden. Tê payîn ku navenda meya vaksîna-koronayê ya li Lüneburgê, di Şibata 2021-an de jibo cara yekem randevûyên vaksînêdanê pêşkêş bike. Ez dixwazim hûn gazî bikim ku ji vê derfetê sûd werbigirin. Ji ber ku bi vî rengî hûn xwe û mirovên din ên li dora xwe diparêzin. Vaksînêdanê jibo we bê pere ye.

Ji **28-ê Çileyaya 2021-an** ve hûn dikarin jibo **Vaksînêdanê, randevûyê** bigirin an jî navê xwe tîxin ser lîsteya bendewariyê. Du vebijark hene: bi tîlefonê an bi rêya înternetê.

Hûn dikarin **xeta taybet a Vaksînêdanê ya Eyaleta Niedersachsen** bigirin ku bi vî rengî ye **Hejmara Têlêfona 0800 9988665** - Têlêfon bê pere ye
Duşem heya şemî li demjimêr 8ê danê sibê heya 8ê danê şevê
Heke randevû tune, hûn dikarin navê xwe li ser lîsteya bendewariyê bihêlin.

Randevû li ser hêl li ser malpera **www.impfportal-niedersachsen.de** tîne girtin.

Landkreis Lüneburg Auf dem Michaeliskloster 4, 21335 Lüneburg
T 04131 26-0, F 04131 26-1466 www.landkreis-lueneburg.de

Sparkasse Lüneburg IBAN DE60 2405 0110 0000 0038 71 BIC NOLADE21LBG
Volksbank Lüneburger Heide IBAN DE17 2406 0300 0199 9990 00 BIC GENODEF1NBU



metropolregion hamburg

Ma hûn jibo **girtina randevûyê** an **ajotinê bo Navenda Vaksîna-Koronayê** arîkariyek dixwazin? Heke malbat an aşnayên we nikarin piştgiriya we bikin, şaredariyên me alîkariyê pêşkêş dikin. Hûn dikarin li ser vê yekê di nameya pêvekîrî de bêtir agahdar bibin.

Yek tiştêk ku hûn hewce ye bizanibin: Di destpêkê de dê tenê çend randevûyên vaksînlêdanê hebin. Ji ber ku vê gavê vaksîna koronayê pir hindik heye. Ji ber vê yekê ji kerema xwe sebir bikin - belkî hewce be ku hûn çend heftan li benda randevûyê bimînin. Di navbera biharê de, tê payîn ku randevûyên vaksînlêdanê zêdetir bibin.

Me pirs û bersivên girîng ên di derbarê Navenda Vaksîna-Koronayê ya navçeya Lüneburg û vaksînlêdanê de jibo we li ser rûpelek agahdariyê amade kiriye. Ew bi vê nameyê re hatî vegirtin, û herweha niwandinek li ser pêşniyarên alîkariyê şaredariya we.

Ji ber vê yekê, beşdar bibin û li dijî vîrusa koronayê vaksîn lêden. Ez ji bo pêşerojê her tiştên baş ji we re dixwazim - sax bimînin!

Ya we

Jens Böther
Rêvebirê Navçeyê yê Wîlayeta Lüneburg